STOP !

SIYASETA DEWLETA TIRK ÎFLAS KIRIYE

Demhat Dêrikî

Dema kesek bi nexweşiyek bêçare dikeve û pêlên mirinê di hundir de zora pêlên jiyanê dibe bêguman yê li dawiya sekerata "mirin" be! Siyaseta dewleta tirk beramber pirsgirêka gelê kurd vê dîmenê ji hemû aliyan ve dide diyarkirin. Kemalîzm di qonaxên duh, îro û sibe de. Di kesayetiya artêşa tirk û Erdogan de ku çareserkirina rasteqîne ya pirsgirêka gelê kurd mirina xwe dibînin, bûne zelamê "nexweş"! berpirsên textê Enqere îflas kirine û nema zanin çi bikin.

Tenê şer! Tenê girtin û kuştin! Tenê komkujî û hemû şêweyên siyaseta kirêt ji bo xwe rewa dibînin. Anku, li hember guhortin û deskeftinên li herêma Kurdistanê û biryara tevgera miletê kurd boriyên heneseyên wan hatine girtin. Ji ber vê çendê, ji bo ku astengiyan li dijî destkeftinên gelê kurd derxin, gefan li DAY, yê û Ewropa dikin. Caran dibêjin em dê el-Qaîda nas bikin û piştgiriya wê bikin. Caran dibêjin em dê partiyeke Îslamî ava bikin; ji bo kurdan û caran jî dibêjin em dê behsa "komkujiya" hindiyên sor nas bikin. Dewleta tirk dixwaze hemû cîhan şerê kurdan bike da ku mebestên xwe yê kirêt pêk bîne.

Lê, li gorî dîtina min li van demên dawî de, pir zelal hate dîtin, ka çawa dewleta tirk di warê dîplomasî, siyasî û leşkerî de îflas kiriye. Ev demeke bi hêceta şerê li dijî PKK-ê ku piştgiriyê ji Emerîka wergirtibû; ev piştgirî, piştgiriyên dawîne ku yê çi rê ji bilî çareserkirina pisgirêka kurd di warê siyasî de nemîne, çiya û gundên herêma Kurdistanê bombebaran dike. Di van êrîşan de kesên welatî hatin kuştin, gundên wan xirabûn, bi sedan giyanewerên wan kuştin, di bin mercên dijwar de pir malbat ji war û gundên xwe koç kirin. Ji aliyekê din ve serokê artêşa tirk van êrîşên hovane wek serkeftin li dijî PKK-ê dibîne. Gelo, kuştina welatiyan serkeftine yan îflasbûna siyasetê ye? Lê, gelê kurd baş dizane ku hemû hewldanên dewleta tirk, êrîş û gefên wan armanca xwe ew e ku aramiya li herêma Kurdistanê aloz bikin û dîwarên astengiyan li pêşiya pêşketinên li Kurdistanê bilind bikin. Lê, diyare ku wan ji bîr kiriye ku duh ne îro ye, îro dê ne sibe be. Helwest û biryara serokê herêma Kurdistanê û tevgera gelê kurd vê yekê bi wan dide diyarkrin.